


Sebrî Botanî

# DENGÊ METÎN Û CÛDÎ

Dîwana -3-

Institut kurde de Paris

Stockholm 1993

APEC

Institut kurde de Paris

1.

01/12/2017
922 BOT DEN

Sebrî Botanî

# DENGÊ METÎN Û CÛDÎ

## Dîwana - 3 -

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE
Institut Kurde de Paris

Stockholm 1993
APEC

Institut kurde de Paris

Sebrî Botanî

# DENGÊ METÎN Û CÛDÎ

## Dîwana - 3 -

Weşan no:47

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

© Sebrî Botanî
Weşanxana APEC

*Adress*:
APEC-TRYCK & FÖRLAG
Spångavägen 345
Box 3318, 163 03 Spånga/Sweden
Tel: 08-761 81 18 Fax:08-761 42 90

**ISBN: 91-87730-47-2**

**APEC**

# Têbînî

Çendek ji helbestên vê dîwanê di rojname û kovaran de hatibûn belavkirin. Bi umêda çapkirina wan jî di dîwana ”**Bilûra Çiyan**” de. Lê pa mixabin bi windabûna destnivîsa ”**Bilûra Çiyan**” re, ew hêvî jî windabû. Ji lew re me ew çend parçe jî di vê dîwanê de çapkirin. Wek helbesta ”**Gurgo were xûnê bimêj**” û ”**Cejna aştî**” ku yên berî bîst-sih salan e... Lê yên dî hemû ji sala 1990-93 hatine hûnandin...

Dixwazim bêjim jî ku ew destnivîsa windabûyî her dîsan ji tuxmê van helbetan e.

Ji lew re gerek e bêjim ku windabûna wan ne tiştekî giring e. Lê bê guman eger peyvek tenê jî, resen û nebelavbûyî di nav de hebit, ez bi ziyanek mezin dizanim.

**Sebrî Botanî**
1993 Stockholm

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

## Êdî bes e heta evro

Men huwe ela heq gelo
Muawiye yan jî Elo?
Ev bû dersa mizgefta min
Ji wê rojê heta evro

Hem derebe Zeydo Emro
Yanî Zeydo deyna Emro
Êdî herdu man biheve
Ji wê rojê heta evro

Hem qeteltum, qeteltune
Ji bil vê qet tiştek tune
Her kuştin û talan e bes
Ji wê rojê heta evro

Institut kurde de Paris

Ne hişt ez çavên xwe vekim
Li dunyayê temaşe kim
Perîşan û bindes kirim
Ji wê rojê heta evro

Şêx û mela gerçî kurd in
Ji bona min kul û derd in
Dixwestin min winda bikin
Ji wê rojê heta evro

Bi kurdî qe tiştek negot
Ziman û dîroka min sot
Ez bê maf û nîne kirim
Ji wê rojê heta evro

Hêdî hêdî maf û pênas
Sipartin hovikên pêxwas
Ji bo vê ye şervan im ez
Êdî bes e heta evro

Institut kurde de Paris

# Bi xoşî û serfirazî

Jenîna dil bo te ye
Soz û peyman eve ye
Destê xwe b´de destê min
Me niyaza hev heye

Bi xoşî û serfirazî
Bi xoşî û serfirazî

Dotmamê ez xulamê
Te nebînim bê jînî im
Te j´ bîr nakim na b´ xudê
Bi te jînê dibînim

Bi xoşî û serfirazî
Bi xoşî û serfirazî

Institut kurde de Paris

Biharê xemla xwe kir
Ordekê hêlîn çê kir
Evîn e bihara dil
Ya me jî ve despêkir

Bi xoşî û serfirazî
Bi xoşî û serfirazî

De rabe rabe rabe
Pîroz ke vê evînê
Her du dil hev dixwazin
Hêlîn xoş e b´kevînê

Bi xoşî û serfirazî
Bi xoşî û serfirazî

Bihar e xoş bihar e
Evîn û evîndarî
Bilbil bo me dixûnin
Tu yî bûka vî warî

Bi xoşî û serfirazî
Bi xoşî û serfirazî

Institut kurde de Paris

# Bê te jîna min jan e

Gulê gula nîsanê
Rehmê bike dîsanê
Bilbil dîsa bixwînin
Li vê geşt û seyranê

Lê gulê gulşîlanê
Xwezka m´ şeva dîlanê
Evîna te agir e
Ez birme ber nemanê

Gulê gula gulanê
Eşqa te da dilanê
Rabe were govendê
Ez û tu mil milanê

Qalçîçeka çiyanê
Li min neke behanê
Ramûsankê bide min
Şeql û hêla peymanê

Gulê gula hemyanê
Were canê semyanê
Bê te jîna min jan e
Bi Încîl û Quranê

Institut kurde de Paris

# Gula min

Ew ronahî kê kir tarî
Bi sanahî tu j´ m´ standî
Gula min
hey delala dilê min

Yê j´ min kêmtir ej wî çetir
Ji destê min tu revandî
Gula min
hey delala  dilê min

Ez bi halê te dizanim
Hey şeql û hêla mala min
Gula min
hey delala dilê min

Çare nîne bo derdê min
Ji bil xebata milê min
Gula min
hey delala dilê min

Institut kurde de Paris

# Adar e

*Pêşkêş e bo zarokan*
*radyoya dengê Serxwebûnê Stockholm - Swêd*

Adar e xweş Adar e
Dem demê keyf û kar e

Tu b´ xêrhatî Adarê
Di gel bûka biharê

Serma revî çû nema
Hat çaxê geşt û sema

Hateve sersala me
Şahî xiste mala me

Newroz e xweş Newroz e
Cejna me ya pîroz e

Awazên eşqa kevnar
Dagirtin dol û zinar

Welato em bi gorî
Cejna me hat û borî

Hat û borî dê hêtin
Me Newroza xwe d´vêtin

Institut kurde de Paris

# Jîna min e ev aqar

*Pêşkêş e bo zarokan*
*radyoya dengê Serxwebûnê Stockholm - Swêd*

Ev ro dayka min gotî
Babê te dê çit cotî

Gotî naçim ji gundî
Xwe nakime efendî

Ez mirovek cotyar im
B´ gundê xwe bêxtiyar im

Li gundê xwe dimînim
Azadiyê dibînim

Xoş xelat e ji Yezdan
Ev ax û av û bustan

Çi qas xoş e ev welat
Deşt û çiya lat û lat

Jîna min e ev aqar
Xwîna min e rez û dar

Institut Kurde de Paris

# Li me pîroz her û her

Cejna Newroz mijde da
Deşt û çiya kir gulav
Gul û gulşen xemilîn
Vejîn bijîn em di nav

Peyama cejna pîroz
Eşq û evîn berda ser
Bilbil û kew dixûnin
Ji bo welat sed silav

Bijî maf û tenahî
Li Kurdistan seranser
Çi qas xweş e rizgarî
Ceng û xebat û bizav

Institut kurde de Paris

Axa me ye em li ser
Ji bo wê em dikin şer
Here dijmin derkeve
Yên me ne ev xak û av

Aştî ye rêbaza me
Azad bijîn bê keder
Serxwebûn e doza me
Gorî dikin dil û çav

Varî nabin em ji vê
Çavê şerxwaz bête der
Ahenga cejna Newroz
Li me pîroz her her

Institut kurde de Paris

# Gemşo

Ev şiira min ne şiir e
Pênasa xaîna ye
Min hêvî ye ji dostan
Nebên şiira dîna ye

Kurdiya min lawaz e
Ne ya kesê xwenda ye
Nebêjin zimankuj e
Rêka ziman berdaya

Kurd im kurdî nizanim
Ev çi derd û bela ye?
Ev çenda ku dizanim
Bi xêra sê mela ye

Çi b´kim pîr im bê şol im
Ev şola bê şola ye
Xweş li bejna Gemşo tê
Wî gorra xwe kola ye

Gemşo kî ye û çawa ye
Bîjoke sed awa ye
Milet bi raporên wî
Şev û rojê wayway e

Institut kurde de Paris

Kesê jêve nêzîk e
Çeq çeq û bismila ye
Kesê hat bîra Gemşo
Bextreş û waweyla ye

Ji bo dirav û xelat
Dijminê pêşmerga ye
Çepel û firşikheram
Deyozê ber derga ye

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Merhebayek ji dijmin
Li cem wî pir biha ye
Madem rewşa wî baş e
Dinya ye her weha ye

Hişyar û çav li pey bin
Gewadê cendirma ye
Çepel e wek karê xwe
Rûmet li cem nemaye

Gelo were bibîne
Gemşo ye Gemşo va ye
Zana ye cem nezanan
Ser ser û ser çava ye

Institut kurde de Paris

Ehmeq hene dibêjin
Xudanê sed xêra ye
Pirr pak û dilnazik e
Mîna rebendêra ye

Bawer nakin casûs e
Nihêngirê mala ye
Dijê doza Kurdistan
Bo me derd û bela ye

Herdem dilxweş û haş e
Xudanê çend meaş e
Bê westan û bê zehmet
Hemû jî her belaş e

Nerist î nebada yî
Wî konê reş vedaye
Dil çi dixwazî heye
Polek jî pê nedaye

Kirasê seddolarî
Tu d´bêjî qey paşa ye
Xwe pirr hêja dibînit
Caşê kurrê caşa ye

Institut kurde de Paris

Di gel Elo ye ji dil
Mîkrob e derd û ta ye
Bi her pîvan û halî
Semsarekî hosta ye

Yan plangerê şeva ye
Li meyxanê zava ye
Wî mal li me wêran kir
Ya wî hêşta ava ye

Çend û çi qas tu bêjî
Ev Gemşo şareza ye
Xelatê min ji bo wî
Şiirek ya Şêx Reza ye

Şîreta min bo Gemşo
Ev dewrana dunya ye
Tu hema çi d´kî bike
Dawiya te xuya ye

Ma tu kor î nabînî
Ala me l´ ser çiya ye
Sibe xemla welat e
Şoreş herdem şiya ye

Institut kurde de Paris

# Kurdistan Kurdistan

*Pêşkêş e bo zarokan*
*radyoya dengê Serxwebûnê Stockholm - Swêd*

Deşt û şax û newal in Kurdistan Kurdistan
Gund û bajar û mal in Kurdistan Kurdistan

Çi xweş aqar û war in Kurdistan Kurdistan
Rez û bîstan û dar in Kurdistan Kurdistan

Pirr pakij û delal in Kurdistan Kurdistan
Avên sar û zelal in Kurdistan Kurdistan

Hawîr pez û dewar in Kurdistan Kurdistan
Zevî li çar kenar in Kurdistan Kurdistan

Hem pesar û kendal in Kurdistan Kurdistan
Xet û nîşan û xal in Kurdistan Kurdistan

Institut kurde de Paris

Dicle û Firat rûbar in — Kurdistan Kurdistan
Ne yeke û ne hezar in — Kurdistan Kurdistan

Xweş dîmen û keval in — Kurdistan Kurdistan
Tev yên me ne xomal in — Kurdistan Kurdistan

Hemû yek e ne çar in — Kurdistan Kurdistan
Yên dixwin çar neyar in — Kurdistan Kurdistan

Hov in bi ser da zal in — Kurdistan Kurdistan
Em jêra tim dinalin — Kurdistan Kurdistan

Bi qêrr û bi hewar in — Kurdistan Kurdistan
Ji cengê ra li kar in — Kurdistan Kurdistan

Institut kurde de Paris

# Cejna aştî

Li yazdehê Adarê
Yanî serê biharê

Bihara xoş û rengîn
Li dunyayê bû dengîn

Dengê aştî û azadî
Seyran û keyf û şadî

Ji pêlweşê me zanî
Ji Bekir û Barzanî

Her bijî kake Bekir
Bi rastî xwe kir şekir

Kurd û ereb bûne yek
Bi bîr û bawer û çek

Bi yek dil û yek viyan
Xoş kirin bo me jiyan

Institut kurde de Paris

Gul û gulzar geş kirin
Ruyê dijmin reş kirin

Da em bijîn serfiraz
Ne jêrdest û belengaz

Cîhan li me bû sahî
Tev xoşî û tenahî

Ey dijminê devgenî
Êdî bi me nakenî

Ken û şadî bo me ne
Şîn û giryan bo te ne

Bibîne keyf û sema
Bimre bi derd û xema

Tenha maye bo te rev
Êvar e dinya bû şev

Şermezarî li te ma
Serbilindî li me ma

Her du partî heval in
Du welat û yek mal in

Institut kurde de Paris

# Ciwanê Kurd

Wek hevalan ciwanê kurd
Tu jî rabe bide deng
Zend û bendan tu rapêçe
Dest bavê darê tifeng

Jîr û çalak, xwe bavêje
Ey lawê çak û çeleng
Bi mêranî tu bistîne
Vî welatê şox û şeng

Hilo bira rabe ji xew
Li me kurdan bû dereng
Baş bizane tu bê maf î
Ger nestînî tu bi ceng

Institut kurde de Paris

# Bilûra min

Bilorîne, bike gazî
Çi hawar û çi qêrrîne
Kurd milet e, bê dewlet e
Ji her alî dilbirîn e

Bilorîne, bike giv giv
Ew dizanin çi giv giv e
Dengê Metîn û Cûdî ye
Kurmancî ye wek hingiv e

Institut kurde de Paris

## Pîrejin:

Pîr û ciwan û zarok
Kes li mala nemabûn
Pîrejinên weke min
Li ber dîwara mabûn

Dol û newal û gelî
Ji xelkê me mişt bûbûn
Kunên hirç û beraza
Hotêlên hejara bûn

Şkeftên bab û bapîran
Bûbûn koçka Hemayon
Şahîn û bilbil û kew
Hêlîn vala hêlabûn

Tirs û birs û nexoşî
Di gel cengê peydabûn
Tang û top û balefir
Tev agir û birûsk bûn

Institut Kurde de Paris

Li welatê me kurda
Sed reng sitem diyarbûn
Dêr û mizgeft û xanî
Ser û bin weran dibûn

Karwanê şehîda çû
Nîvî pitir zarok bûn
Gelek heval û hogir
L´ ber çavê min hindabûn

Şahîn û Gurgînê min
Bi meranî şehîd bûn
Dê her li bîra me bin
Gorî welatê xwe bûn

Ji bîra me naçin qet
Her çend e nependî bûn
Serên hewe bo min sax
Ez bo hewe hêlam çûn

Institut kurde de Paris

# Pêşmerge

Govenda şîn û şadî
Hawar xudê û Şêx Adî
Her dem li me hawar e
Çi qas xweş e azadî

Hawar e hey hawar e
Çi evînek dijwar e
Dijwar e aşiqkuj e
Nazdar e, şengewar e

Hey aferîn Ewropa
Em giredan dest û pa
Ji bo Sedamê çepel
Xudanê jehr û topa

Har bûye neyarê me
Wêran dike warê me
Me bi jehrî dikuje
Pêşmerge nojdarê me

Institut kurde de Paris

# Dengê dehola bextê min

Oxey dilo
Oxey dilo
Dengê dehola bextê min
Careka dî
Kir denge deng

Oxey dilo
Oxey dilo
Hesp û hêstir
Hirç û beraz
Mişk û mar û şêr û piling
Kew û bilbil qaz û quling
Hov û mirov
Careka dî
Hatin bikin keyf û şadî
Li ber dengê dehola min

Oxey dilo
Oxey dilo
Dengê dehola bextê min
Dîlan geş kir
Çiya xweş kir
Oxey dilo
Oxey dilo

Institut kurde de Paris

# Ji Botanî bipirse!

Heval were netirse
Ji Botanî bipirse

Bizane! Baş bizane!
Dilê min kul û jan e

Ger ho bimînit zeman
Çêtir e bo te neman

Te ne nav e û ne war e
Derdê te pirr dijwar e

Derbider û perîşan
Te ne ma nav û nîşan

Rûviyê pîs girt zevî
Piling ji çiya revî

Ta kengî wek niha bîn
Her û her bê biha bîn

Institut kurde de Paris

Kuştina me rewa bit
Wek nêçîra kewa bit

Hawar bikîn ax û tew
Bijî ev û bişkê ew

Her tiral û pirbêj bîn
Hosa zimandirêj bîn

Gotinên me qelew bin
Ser û bin tev derew bin

Heta xebat bi dev bit
Karê me her dê rev bit

Lê em eger di gel hev
Bixebitin roj û şev

Dê hilêtin roja geş
Li ser vê tariya reş

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE
Institut kurde de Paris

# Şîreta min

Cangorî be kurê mino
Ta ku sax î dem û gavê

Şareza be kekê mino
Da nekevî qeyd û davê

Bes e êdî heta kengê
Berevajî biçî ravê

Berde rêça çewt û kirêt
Xwe derxîne ji tengavê

Hilo rabe bilind hilde
Al û xetîra bizavê

Ne zîrek û ne zana bî
Tu ketî botka bişavê

Institut kurde de Paris

Xudênas be babê mino
Ji kes neke lavelavê

Şîreta min bike guhar
Lawê mino kurê bavê

Dilbirîn im şêrê mino
Xwe bike gorî ax û avê

Ez bi lez û hêvîdar im
Bibînim wê şewq û tavê

Ger tu nemrî bi xencerê
Tu dê bimrî bi pêlavê

Şîret bes in me dirêj kir
Ji min bo te vê silavê

Institut Kurde de Paris

# Şivanê pîr

Hezar wek min rewşenbîr
Bibin gorî ş´vanê pîr

Şivan e, berpirsyar e
Şev û rojê hişyar e

Hişyar e ranakevê
Ji dozê danakevê

Şivanê gelê kurd e
Mîna gizîrê gund e

Institut kurde de Paris

Pê xweş e her kizîr bit
Ne paşa û ne wezîr bit

Ne beg û ne axa ye
Rêberekî zana ye

Kul û kovan li ser dil
Barê giran li ser mil

Barê giran karê wî
Karê giran barê wî

Finda rêça tarî ye
Nijadkurd e, arî ye

Ku d´qewimit hazir e
Hêmin e, hem agir e

Çak û çeleng û jîr e
Bo cergê dijmin tîr e

Hebûna wî xebat e
Daxwaza wî welat e

D´rovê miletê me ye
Rewş û xelatê me ye

Institut kurde de Paris

Ji wî ne, ev ristên xoş
Jê têr nabin bîr û hoş

Huner û şiir û çîrok
Gotar û pesn û dîrok

Derdê wî ez nebînim
Batî wî ez nemînim

Da ev xebat serkevê
Jan ji dilan derkevê

Institut kurde de Paris

# Şanoya şoreşvan

Ya ku îro li Dihokê xweş diyar e
Xelkê bajêr serbilind û pir hişyar e
Şanazî ye, "Tîpa Şoreşvan" me heye
Pirr bawer û çak û jîr û bextiyar e

Ekterên wê pirr zîrek û bi şiyan in
Dengê bizava xelkê gund û çiyan in
Tevgera hizra cîhanî bo me anî
Aferîn bo wan, ew leşkerên jîn û jiyan in

Li pêş agirbarandin, piştra gulanîn
Ev "serhatî hemû" li ber çavên me danîn
Şîwen dibû şadî, agir dibû gulşen
Bi şanoyê werar e huner û zanîn

Institut kurde de Paris

# Ji vê şopa xwe vegerin

Van dijminan hûn har kirin
Kirêt û şermezar kirin

Ji rûmetê bêbeş kirin
Li nik milet rûreş kirin

Ji bo dijmin hûn dibezin
Malê me ye ew didizin

Çek û firok pê dikirrin
Li ser Kurdistan difirrin

Pê dikujin biçûk û jin
Pîs û diz in hem xûnmij in

Pê dilşad û serxweş dibin
Devbiken û dêmgeş dibin

Qet carekê hûn napirsin?
Ma dem ji me ew natirisin

Institut kurde de Paris

Van xelatan bo çi didin?
Ma qey bi avê berdidin

Gelo ev xêrxwazên me ne?
Yan dijî daxwazên me ne?

Rûmeta xwe bes bifroşin!
Ji vê camê bes binoşin!

Herê ma qey hûn ne kurd in?
Bo çi hinde hûn ne merd in?

Darê destê qereqoş in
Yan jî wekî palê poşin

Ji bo dirav hev digirin
Ji bo neyar tev dimirin

Em bira ne disa werin
Ji wê şopa xwe vegerin

Tif kin li sifra dijmina
Bes bikujin mêr û jina

Sebrî nema sebr û qerar
Naçar e kir qêr û hewar

Institut kurde de Paris

# Makdêl

Ax pîroza min ax û ax
Ax û ax heta dibim ax
Bimrim, bijîm kurên te sax
Tif li kesê te bihêlî

Min dil ser te nalenal e
Xew û xwarin li min tal e
Gelo ma qey ev jî hal e?
Cerg û dilê min dikêlî

Roja rohnî li min şev e
Jîn û mirina min wek hev e
Wesa jî soza min eve
ku te ne dim bi berdêlî

Institut Kurde de Paris

Ne delîv û ne derfet ma
Ne rewişt û ne heşmet ma
Ne namûs û ne rûmet ma
bi qanûna vî makdêlî

Ger dipirsin makdêl kî ye?
Dêlmak hovek şerrokî ye
Bê namûs e, bîjokî ye
Dij û ne dij tu ber pêl î

Mirovatî li nik nîne
Wî dil her dem rik û kîn e
Dirrindeyek har û dîn e
Heyfa bûka serbixêlî

Ji malbata xwe ve xwehr e
Ji dîn û wijdan bê behr e
Jîn û jiyan gel wî jehr e
Şev û rojê bêjin wêlî

Institut kurde de Paris

# Gurgo were xûnê bimêj

Vê ezezîn û minminê
Em kirîne nizîmên dinê

Çi koçer û çi dêmanî
Tepeser in her zemanî

Hin har in, hin nezan û gêj
Gurgo were xûnê bimêj

Gurgê mezin begê teres
Şêx û mela, behişt û bes

Hin debeng in, hin jî xayîn
Sofî mofî dibên amîn

Institut kurde de Paris

Hemû kirin ker û golik
Hem perêsên zêr û polik

Destê neyar xistin di nav
Hemû ji hev kirin belav

Azadî û huner kuştin
Rûmet ji bo me ne hiştin

Heywax li min mala minê
Em avêtin vê binbinê

Bi fermana van dijmina
Jêk dikujin mêr û jina

Bab û bira hev dikujin
Xan û manên hev disojin

Mîna vê qesra hemzanî
Qesra me bû ger bizanî

Me wêran kir bi dînamêt
Paşê me kir agir û pêt

Institut kurde de Paris

Nê ew xanî her bo me bû
Lê çunkî me eqil ne bû

Ji rik me agir berdayê
Xudan jî me da Bexdayê

Miletê xwe neêşînin
Bo me pişt e em pêşîn in

Kurdo şev û roj bixurre
Qonax bi qonax bibirre

Dijminê te har û dîn e
Tola zêrîn jê bistîne

Jînê bi xûnê geş bike
Neyarê xwe bextreş bike

Institut kurde de Paris

# Venagerim

Têm û diçim li te d´gerim
Aware bim li te d´gerim
Direvim jî li te d´gerim
Dikevim jî li te d´gerim
Ku nivistim xewna min î...
Êrîş dikim li te d´gerim
Navegerim heta d´gehim
Li te d´gerim, li te d´gerim

Institut kurde de Paris

# Tajîkên nêçîra pîs

Ji eşqa jargeha naz e
Ev kêferata hişk û tal
Kes li bîra kes nemaye
Me her ew e xewn û xeyal

Ew tajîkên nêçîra pîs
Ya wan dirav e ol û al
Xwe sipartin destê neyar
Hem jêra xwe kirin mertal

Xwe kirêt û riswa kirin
Em jî di gel xwe sal û sal
Ew dijminên serê xwe ne
Lew jî neyar ma zal û zal

Her dem xwezîxwaz in ji dil
Ku dom bikit ev rengehal

Institut kurde de Paris

Bê çare man yên dî hemû
Yan jî bi carek bûn tiral

Lê ev li pey dozê diçin
Ya ku dimrin jêra heval
Pirr pirr di agirê wê da sotin
Zar û zîç hem ser û mal

Di gel vê jî şêx dibêjit
"Evê dunya pûç û betal
Nekin ji bo xwe bar û xem
Mişte behişt qîzên şepal"

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Lê ew bi xwe her dixazit
Keyfa dinê jinên delal
Wî kar û pîşe şev û roj
Pîlan û xap, nivişt û fal

Ey Botanî bes binale
Qet feyde nadit nalenal

Institut kurde de Paris

# Rabin Rabin

Milet rabû şoreş serkevt
Neyar va ye  ha ha şikest

Hat mizgînî dijmin revî
Bo me hêlan war û zevî

Rabin rabin
Hilon rabin
Rabin rabin
Wek bira bin

Werin werin zû zû werin
Lez kin werin hemû werin

Em şervan in li hember in
Rext û fîşek li kember in

Institut kurde de Paris

Rabin rabin
Tev tev rabin
Rabin rabin
Wek bira bin

Îro em cîhandost in
Şerm e ku em bindest in

Em kurd in serbilind in
Werin em alê hildin

Rabin rabin
Pêkve rabin
Rabin rabin
Wek bira bin

Hilo were Lezgîn were
Rabe Şoxê tu jî were

Lez ke were Gorgîn were
Zînê tu jî bi lez were

Rabin rabin
Hemû rabin
Rabin rabin
Wek bira bin

Institut kurde de Paris

# Marşa rizgarî

Pîroz in biryarên me
Şoreş û tevgerên me
Bi navê Zerdeştê me
Ji xebata salên me
Bi şîreta kalên me
PKK qismetê me
Daxwaz ji armancên me
Soz û doz û mercên me
Xoybûna miletê me
Heval û endamên me
Ew in dil û canên me
Amed e paytextê me
Bi hêza çekdarên me
Revîyan neyarên me
Xwe davêjin bextê me
Bi bîr û bawerên me
Bi xûna rençberên me
Azadî hat destê me
Yekbûna yek yekên me
Jêr ala PKK´ên me
Dijmin dike dostê me
Werin xuşk û kekên me
Nêv rêz û xelekên me
Biparêzin textê me

Institut kurde de Paris

# De bimre lo

Wek te kujek me nedî kes
Her dem bi xûnrêjî bijî
Ma tu jê têr na bî teres
Heta kengî her bikujî

Aşiqên jîna tenahî
Wan hizrete yek du nefes
Te xêr e lo ma tu namrî?
Jîna te çû bi xûnrêjî

Te ne hêlaye bo kesek
Ne tenahî û ne hewes
Behra xelkê tirs û birs e
Seyên te ne, têr û tijî

Ma ji Xudê jî natirsî
Şermê nakî ji mirovî
Şahê mirinê va ye hat
Jîna te çû bê dirêjî

Ta tu nemrî tena nabim
De bimre lo ma qey ne bes?

Institut kurde de Paris

# Sibe xwedî dewlet im

Miletek  qareman im
Hember zora zeman im

Ji bîr nakim doza xwe
Qet naşkênim soza xwe

Şer dikim bê rawestan
Nizanim çi ye westan

Şer dikim, şer naxwazim
Welatê xwe dixwazim

Niştê min e, dêrîn e
Ber dilê min şêrîn e

Gerçî îro bindest im
Sibe ez jî serbest im

Institut kurde de Paris

Hebûm dereng hatîme
Hişyar û kêrhatî me

Ji mêj ve ez milet im
Sibe xwedî dewlet im

Xebata min zanist e
Dijminê min faşîst e

Ji xaviyê hez nakim
Xebata xwe bes nakim

Her tiştê min b i kurdî
Li bajar û li gundî

Azadî xelatê min
Kurdistan welatê min

Hingê dîsan dirist im
Kurd im aştîperest im

Nimûnê pakdilan im
Dostê hemû gelan im

Institut kurde de Paris

# Bo hevalê min
# Silo

Jaro belengazo Silo
Ewî dêwê hezarser
Tu bi lale û bazinkirî
Bê hêz û bê bawer kirî
Ew dilbera nazik delal
Ji te stand û kire xelat
Bo deyozek nizm û nezan

Jaro evîndaro Silo
Qet me nedît
Bi lavelav û gazin
Kes derketî ji bazin

Institut kurde de Paris

Jaro birîndaro Silo
Vegerandina wê şox û şêngê
Bizaveka dirêj divêt
Bizavê jî hêz û aram divêt
Evê jî oleka pakij divêt
Vê olê jî hîkar divêt
Ew hikar jî ez im
Her dem li kar im
Were nik min bo te bêjim
Çiroka hêz û bizavê
Te rê kim nêçîr û ravê

Institut kurde de Paris

# Nefî hilo meydanê

Institut Kurde de Paris

Nefî hilo meydanê
Şiira te pir hêja ye
Yên tu kuştîn, me d´kujin
Dewlet bi dest gêja ye

Osmanlî sekitî çû,
dewra kemalîsta ye
Azadî bûye hesret
Qanûna faşîsta ye

Sultan, Yehya mirin çûn,
Lê kemalîzm jîya ye
Sultanê pîs Ataturk,
ew jî di nav mirya ye

Rêberek nuh rabûye
navê wî EBDULA ye
Nasnavê wî **APO** ye,
vîna bîr û dila ye

Wijdansax û pakij e,
Şanaziya kurda ye
Ji bo welat û milet,
wî al bilind hildaye

Nemana Kemalîzmê,
daxwaza me hemya ye
Eger çî ta niha jî,
rewrewa şêx Yehya ye

Kemalîzm va dimre,
Artêşa wê şika ye
Ew generalên faşîst
dikin lav û tika ye

Ev şoreşa **PKK**
Dermanê giş derda ye
Nexş û nîgarê rengîn
bi zêr û zîv kildaye

Institut kurde de Paris

Xem û kulên me d´revin
ceng û xebat sema ye
Êdî kesek nabêje
gelê kurd paşve maye

Em qet xwe winda nakin
Kurd in heta heta ye
Her ji niha ve NEFÎ
dar çû dayka çeta ye

Kurd û tirk cîran bijîn
ev rastiya dunya ye
Du dewlet geş û nûjen
aynde bo her duya ye

Institut kurde de Paris

# Bo kurdekî meynoş

Heta kengî tu dê vexwî?
Ji wê jehra serê marî

Ewî dilê xwe yê nazik
Pê birrzînî rengê darî

Bê hay û hiş herî werî
Bikî, bêjî, biaxivî

Evê dunya geş û rohnî
Li xwe bikî reş û tarî

Çima kêmtir ji nîvê wê
Nadî carek alîkarî

Bo serxwebûna gelê xwe
Bi navê cenga rizgarî

Tif li te û li karê te
Li wê jehra te vexwarî

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·
Institut kurde de Paris

# Hîvan

Hîvan kurê Sorê ye
Şol kotek û zorê ye
Hêşta girar nekelî
Hazir e l' ber dorê ye

Hîvan şêrê domiz e
Şekroka tirş û miz e
Zarokno jê birevin
Karê wî her topiz e

Nola gîskê dermal e
Pirr pakij û delal e
Qoç û pehîna didit
Ji lew her bê heval e

Institut Kurde de Paris

Lê ku l´ mala xalê ye
Nobedarê malê ye
Na hêlê tiştek bişkê
Salê heta salê ye

Swar be li hespê bayê
Bifre were Bexdayê
Xudê te xweş bihêlê
Bê te sebra me na yê

Hîvanê hejdeheyvî
Hêşta niza bipeyvî
Ji şeş kurr û heşt nevî
Tu yî berdest û hêvî

Institut kurde de Paris

# Şerm e kurro

Şerm e kuro bo te
Ev hemû derd û hejarî
Xelatên te ne kurdo
Pêşkêş dikim diyarî

Bizav im ger bizanî
Helal im, ne heram im
Yarka te me lo najîm
Bê çek û alîkarî

Institut kurde de Paris

# Me îro PKK heye

Hey PKK hey PKK
Karê me xebat û çek e
Hey teq û teq, hey teq û teq
Çare nîne tolê veke

Kurdistan welatê me ye
Milet hemû li pey te ye
Hey teq û teq, hey teq û teq
Me îro şoreşek heye

Şev û rojên me xebat e
Ser û malê me xelat e
Hey teq û teq, hey teq û teq
Me dîn û îman welat e

Êzîdî, fileh, misilman
Bintest in tev sal û zeman
Hey teq û teq, hey teq û teq
Yan serxwebûn yan jî neman

Ey qehraman ey PKK
Nalîna Burca Belek e
Hey teq û teq, hey teq û teq
Milet di gel te dilek e

Institut kurde de Paris

# Caş:

Ez im caşê kurê caş
Zirçikan didim pêş û paş
Xudan alif û meaş
Bi saya serê Emaş
Xuşka min a sipîlaş
Lê kom dibin sed heşaş
Bi sanahî û hem belaş
Kom dikit zêr û qumaş
Bi zirezir û dabaş
Diçme Barzan û Sorda ş
Çi qas bikim zirrezirr
Ew qas dikim tirretirr
Ku mala min ava bit
Bila welat wêran bit
Eger hebit min filûs
Min çi hacet binamûs!

Institut kurde de Paris

Daxwaza min derhem e
Dijminê pêşmerge me
Caş im caşê şêxî me
Ne caşek serserî me
Hecîyek sêbendî me
Salek dî efendî me
Xudan dikan û pare
Hem qesr û hem seyare
Li nik min her bihar e
Derdê par û pêrar e
Ji nû peydabû çare
Şansa hêja û bijare
Meaş sêzde dînar e
Ser bextê min xoş kar e
Fursan hemû bira ne
Xelîl jina hemyan e
Her bijî zeîm Xelîl
Ew e semyan û delîl
Ger me hebît ev semyan
Ma bo çi ye Kurdistan
Ez im caşê kurê caş
Zirçikan didim pêş û paş

Institut kurde de Paris

# Her kes
# û
# pîroza xo

Ez bi lez û beza xo
Va ye gehiştim Zaxo
Xelkê radkim govendê
Ahenga Newroza xo

Ez pir viyan û hest im
Mixabin ku bindest im
Dayka min e Kuristan
Bi evîna wê mest im

Institut kurde de Paris

Nûjen dikim soza xo
Pêyman didim doza xo
Welat e pîroza min
Her kes û pîroza xo

Ji vêrê diçme wêrê
Ji wêrê jî bo vêrê
Vexun rabin govendê
Bajarê keyf û xêrê

Ez hati nav çelengan
Min guh neda debengan
Dikme hawar û gazî
Ez im dengê bê dengan

Institut kurde de Paris

# Wek dîwarê Berlîn î tu

Yê ku tirsa Xudê di dil
Her ez im ez
Her ez im ez

Ew çepelê bê ol û dîn
Her tu yî tu
Her tu yî tu

Yê ser tijî bîr û bawer
Her ez im ez
Her ez im ez

Ew şerxwazê Xudênenas
Her tu yî tu
Her tu yî tu

Yê ku mirovperwer ji dil
Her ez im ez
Her ez im ez

Institut kurde de Paris

Yê ku ji bil xwe kes nevêt
Her tu yî tu
Her tu yî tu

Yê ku tim haş û xweş mirov
Her ez im ez
Her ez im ez

Te dil nîne ne mirov î tu
Wek hov î tu
Wek hov î tu

Yê ku dîwarşikên ez im
Her ez im ez
Her ez im ez

Derng û zû herriftî tu
Wek dîwarê
Berlîn î tu

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHEQUE
Institut kurde de Paris

# Mizgîniya Mezin

Mizgîniyek mezin hat
Kurd bûn dewlet li başûr
Min digotê hey hawar
Kanê al û ka sinûr?

Got: Lezke rabe serxwe
Bes bike qêr û nalîn
Me tu şûştî j´ qirêja
Zeyd û Kemal û Stalîn

Lezke hilo dereng e
Peyvên şîrîn vehîne
Bo vê govenda mezin
Bi TV yê b´gehîne

Institut Kurde de Paris

Min gotê xwe şaş meke
Parastina rizgarî
Xem û xebat û xûn e
Ne aheng û xemsarî

Hezar sal e kurd bindest
Hawar û nalenal e
Dixwazin dewleta xwe
Dewlet sinûr û al e

Got rabe ey Botanî
Te neman derd û bela
Min got here pîroz ke
Li caş û şêx û mela

Kesê baş e li paş e
Hevsar bi destê caş e
Xudê bikim roj bihêt
Bêjin Botanî şaşe

Institut kurde de Paris

# Kurd im heta dimrim

Ger sed carî herî werî
Guh na dim ez peyva kerî

Ne Kerîm e û ne Qasim e
Çepelek pîs û çar sim e

Em wê dikin ya ku ji me tê
Bo milet û bo "umtê"

Kurd im, kurd im, kurd im, kurd im
Heta dimrim kurd im, kurd im

Tu xewn û xeyala min î
Koka binemala min î

Tu dêrîn û nûya min î
Dereng û zû tu ya min î

Şev û roj hawar û gazî
Ez te d´xwazim tu mi´ d´xwazî

Institut Kurde de Paris

# Rojname

Rojnameyê şekir tehl e tu şîrîn î, tu şîrîn î
Tu dermanê hiş û bîrên kesên wek min dilbirîn î

Sifatê te rojname ye, navê te jî Rojname ye
Ne tenê ez çavê sî milyon kes li bejna te ye

Ji xwendina te têr nabim ey hejmara pirovayê
Civata te nadim qet ez bi hemû malê dinyayê

Ew kesên ku te nanasin, nezan in ew çavtarî ne
Agirê sor ji te dibarî hinek gul jî bibarîne

Bibarîne gul û agir, agir bê şik bo neyar e
Hewce nîne ez dirêj kim hûn dizanin rê diyar e

Dengê bajar û gund û deşt û çiya û zozanên me ye
Keşkola dîrok û huner û doz û daxwazên me ye

Neynika xweşî û bextreşiya heftê salên me ye
Gulistana zarê me ye, şîretkara malên me ye

Rêça xebata Pîran û Berzencî û Barzanî ye
Kurdno şerme ji bo me ku hêşta me nezanî ye

Ev amanca Celadet e hem dîwana Cegerxwîn e
Heydê keko zû peyda ke her bixwîne û têr bixwîne

Institut kurde de Paris

# Di gel Yezdan

Ev hezar û çarsed sal e
Li welatê min "enfal" e
Ser û mal û namûsa min
Li dijminê min helal e

Evan misilmanên qeşmer
Îslam li min kirin xencer
Bi ayeta enfala reş
Muhemed jî kirin Hîtler

Ey Xudaye şev û rojan
Bila bes bin ev derd û jan
Ev dîn eger dînê te ye
Kê kir hevalê xûnmijan?

Institut kurde de Paris

Ez li welatê xwe bê soc
Riswa dibim ditevizim
Bi fetwaya mizgefta te
Di xûna xwe digevizim

Ev derdê min, pirr ji mêj e
Çîrok dijwar û dirêj e
Hemû dizin, mirovkuj in
Dîroka wan, miştqirêj e

Ceng û rev e sal û zeman
Kuştim evan derd û xeman
Bûm gedayê vê dunyayê
Nav û namûs jî min neman

Ez rateqandim derbider
Li şer serê min ceng û şer
Min dikujin, hem dibêjin
Selewat li ser peyxember

Li Îslamê zû peyda bûm
Hem şagird û hem seyda bûm
Ji hingê ve heta evro
Girtiyê dav û qeyda bûm

Institut kurde de Paris

Ku Îslam hate meydanê
Hizr û hêza xwe min danê
Min bi xûna xwe mezin kir
Wê ez xistim di zîndanê

Dîn ez kirim sed ol û ol
Sofî mofî bê maf û şol
Misilmanek bi ser û ber
Belengaz û qels û melûl

Bi destê van misilmanan
Evan cîran û pismaman
Tev bi talan û şewat çû
Dam û dezgeh, xan û man

Rejîma tirk û ya faris
Hem erebên nezan û birsî
Rûmeta min perçiqindin
Dîn li derdê min nepirsî

Bi navê te û bi navê dîn
Pênasa min ji min dizîn
Bi ol û qanûnên sexte
Ku ji mêj e hemû rizîn

Institut kurde de Paris

Ey Xudayê jêr û jorî
Ger tu nêzîkî ne dûr î
Heywax li min heta kengî
Ev kotek û zulm û zorî

Nizanim çend sal û dem e
Li pey evê doza xwe me
Her li pey bûm, dê li pey bim
Bê rawestan heta heme

Hawar dikim ez eve me
Xudanê vê qada xwe me
Wek miletan ez milet im
Çima nebim? Madem heme

Ez ku heme gerek hebim
Keyayê welatê xwe bim
Ev hawara min rewa ye
Heta kengî aware bim?

Dixwazim wek wan azad bim
Bi dewleta xwe dilşad bim
Hem dost û hevalê wan bim
Ne kêmtirê kes ji wan bim

Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Bo çi dîlê vî derdî bim?
Tim bindestê vî û wî bim!
Dixwazim ez efendî bim
Ne koleyê kesek dî bim

Tu rast î û rastî xweş e
Ev derdê min dedek reş e
Her çi min got û ez bêjim
Durist û zelal û geş e

Li Mosko kevinperist im
Li Waşinton komonîst im
Li mizgeftê ez kafir im
Li Ankerê terorîst im

Welatê min kirin let let
Nehêlan xwe bikim dewlet
Mizgefta min ne ya min e
Eve karê xwehr û xelet

Mizgefta min erebî ye
Bi tirkî û ecemî ye
Tif li kurdê bêjit bila
Ew ne j´ min e, ew bîjî ye

Institut Kurde de Paris

Şildim û bildim tirkî ye
Kîzb û nîfaq erebî ye
Xîrrrî mîrrrî farisî ye
Pa rûreşiya min çî ye?

Çi derdek hişk û bela ye
Navê Xudê bismila ye
Her tişt bi zimanê daykê
Xweşiya hizr û dila ye

Ku tênegehim ka vîtamîn?
Fayde çi ye amîn amîn
Rastî ev e li min negre
Ey Xudayê alemîn

Zimanên tirk û ereb e
Li welatê min xezeb e
Tu bi kurdî şîrîntîr î
Ev gotinek pirr edeb e

Ji kovanan pirr û mişt im
Dagirtî me ez biriştim
Mizgefta min di gel wan e
Ez bê pişt û bê her tişt im

Institut kurde de Paris

Ew miletê dewlet nîne
Bivêt nevêt ew bê dîn e
Bê dewletî bê dînî ye
Dîn û dewlet j´ min dizîne

Ew kurdê vê nevêjit
Xaîn e yan jî ker e
Rûmebirîndar e kurd
Welat kul û keser e

Dîn û qanûn du nivişt in
Ji ayatan pirr û mişt in
Ji bo weca faşîstan e
Ez û yên wek min pê kuştin

Xudayo min heq navê te ye
Lewra dibêjin heq heq e
Lewra jî ev hawara min
Teq û req û deq deq e

Tif li qencê wan
Len estesnî minhum eheden
Har û hov in, ne mirov in
La yexcelone ebeden

Institut kurde de Paris

Sûnd bi te û bi Încîlê
Bi Tewrat û tehwîlê
Xew naçê çavê kes ji wan
Bê kuştin û qal û qîlê

Îndehum elfitnetu elezzu min eleselî
We re´su l însanî ke re´sin min elbeselî

Tarîxa wan ne tarîx e
Ma çi bêjim? Hema rîx e
Hemû gef û tirre tirr e
Hizirkuj e, wek zernîx e

Ya delîle dûdî fî leylî duca
Ji te ez qet xafil nebûm çu ca´

Sipasdarê te me Xuda
Înnenî mine şşakirinîn
Lakinnenî len ekûne ebeden
Mine ssabirîn

Gotinek pirr şîrîn e
Men sebere zefere
We lakin ela zzulmî
Men sebere kefere

Institut Kurde de Paris

Ew çi sebr e ya îlahî
Ela ceraîmil cubenaî?
Ew ela nezaletî zumretin
Min wihûşil enfalî?

Napalim û jehr û gaza xerdel û çepelî
Min ecmelî hedaya ulaîkel enzalî
Pîr û biçûk pê dikuştin
Ya leha min cemalîl menzerî
Bil ji te kesek nizanê
Ededu ddehaya bi summî wel kîmyawî

Ehaza cezau tedhiyatî
Li turkî wel fursî wel erebî?
Em li îmanihim bil Îslamî de´men
Li ayatîl qetlî we nehebî?

Em ya tura temeen fî malî we helalî?
Be´de tesdîqî ededin min eşrefîl melalî
Nizûlen înde rexbetî tuxatî wel buxatî
Min eshabîl fexametî wel mealî

Xudayo bila hilweşin dîn û dunya
Ela hazîhîl fexfexe wettealî
We ela riûsîna cemîen ji her alî
Da mirovatî rizgarbit ji vî halî

Institut kurde de Paris

Eve ye edalet û musawat û wekhevî
We îleyke ya îlahî ma tebeqqe min meqalî

Şêx jî çû ser menberê
Ihim ihim wek berê
Erê Xudayo erê bi navê te î pîroz
Yuqeddim el hedeya we exreb erreşawî

El cenne wel hûriyyat
Yanî behişt û perî
Lîmen yaqtul sahîb heq
Ez çi bêjme vî kerî?

La edrî emiftîyyen haza em himaren
Yuitî hazîhî el fetawî?

Ey Xudayê ji her kes re delîl
Dexîlê te me ya nîimel wekîl
Zidnî îlmen ez nizanim
Ev xelatin yan bertîl?

Ew tiştê ku ez dizanim
Cudabûna xwe dixwazim
Serxwebûna Kurdistanê
La bedîl we la tebdîl

Institut kurde de Paris

Ez bi darê zorê tirk im
Faris im hem ereb im
Eger bêjim na xaîn im
Kafir im hem bê edeb im

Karek dî hebû gunehtir
Êzîdiyên ji min kurdtir
Ez ji wan re kiribûm dijmin
Kanê fetwa j´ vê çepeltir?

Hem tîyarî û ermenî
Xudayê min hey ez benî
Ev derd bi ser wan da jî hat
Bi emrê ûlî emrên devgenî

Ji bê çareyî şoreşgerr im
Li yekbûna xwe digerrim
Rizgarî biryara min e
Çok çok teşekur ederim

Rizgar nebim her wek nebim
Ku bindest bim, ka azadî?
Ez bi te û bi ŞêxAdî
Sûndê dixum çareka dî

Institut kurde de Paris

Rasîzmên wan gişt faşîst in
Çepizmen wan toranîst in
Qazî û miftiyên wan jî
Hemû wek wan çepalîst in

Ey Xudayê li her derî
Hezkirina te l´ ser vî serî
Lê pa min jî pirsek heye
Ez? Yan Sadam e serserî?

Sadam nevyê peyxember e
Tacul Îslam li ser ser e
Li mizgefta min di gotin
Sadam îmamê Omer e

Ûlî emr e wek Elî ye
Qureyşî ye xweş welî ye
Hawar ez kurd im bi min çi?
Ger welî ye yan xwelî ye?!

Gelek ji van şêx û melan
Hostayên xap û teşqelan
Qereqoşin dînfiroşin
Wan ez xistim derd û belan

Institut kurde de Paris

Kirim derwêş û mam û mam
Dîlê Hîcaz û Misr û Şam
Xudayo wan ez xesandim
Ji her kes re kirim xulam

Ji eraeban erebtir in
Ji erpekan tirktir in
Misilmantî riswa kirin
Ji Xumênî bê dîntir in

Digotin min ey misilman
Kes neçûye banê heyvê
Îyyake summe îyyake
Qet bawer neke vê peyvê

La tuseddiq hazel kelam
Min ehlil kufrî wezzelam
Derewa axir zeman e
Ya ehlel Îslam

Ellahu ekber ya qemer
Çav li kafiran bîne der
Van derewên mezin dikin
Kufrun kebîr hazel xeber

Institut kurde de Paris

Yekê negot maşallah
Her di gotin haşa lîlah
Kella summa kella ya nas
Bêjin estexfurullah

Hosan nezan û ehmeq in
Yan jî bê şerm û serreq in
Xwe xapîn û çavnebar in
Xudayo bila bipeqin

Mirov li heyvê rît û mîst
Bawer nakin îmanleq in
Heqê wan ger nezan in
Bê kar in tizbîçeqçeq in

Bi duristî û bi kurtî
Rad´gehînim bi xurtî
Umer û Cengiz û Lenîn
Wek hev in bo gelê kurdî

Her sê yek in yek ferq nînin
Beramber min dilbikîn in
Xalid, Ataturk, Stalîn
Dagîrker in devbixwîn in

Institut kurde de Paris
...TUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

Lenînîzmê wek Îsalamê
Difna min girt û berneda
Dunya hejand, pirr xûn rijand
Heştî salan tiştek neda

Eger Lenîn eger Zeydu
Ji bona min yekin her du
Ev rastiye û rastî ev e
Xudayê min ez bi navê te eşhedu

Her sê alî çi ev çi ew
Her çi digotin tev derew
Hema her ez dibişavtim
Bi gotinên pûç û qelew

Çi bêjme wan komunistan
Wan jî weku toranîstan
Bê nav û winda dikirim
Bi derdê min dileyistan

Dewleta min wan da Îran
Wan Qazî kuşt, netroman
Stalîn ev kir, Stalîn
Babê komunistên kurdan

Institut kurde de Paris

Sipas edî dilpola me
Ne dîlê ol û mola me
Çak hev dinasin ez û tu
Ne b´ destê şêx û mela me

Hişyar bûme, zêde, ne kêm
Çûme û diçim, dê hêm û hêm
Germ û xurt e şoreşa min
Şêdar im ez dê şêm û şêm

Xudan heq im ez nawestim
Bê rûmet bim ger rawestim
Fîraziya min va ye hat
Bila jî dereng verestim

Soz bit êdî ez û Evdo
Ne bin malek di gel hevdu
Ji min bo te Xudaye min
Hezar sipas û elhemdu

Institut kurde de Paris

# Ferhengok

| | |
|---|---|
| Aram: | Sebir |
| Aheng: | Party (ing.) |
| Aqar: | Ax û zevî |
| Batî wî: | Şûna wî |
| Bizav: | Hereket |
| Dêrîn: | Kevnar |
| Dirov: | Nîşan |
| Hewes: | Zewq |
| Hilo: | Rabe |
| Jênîna dil: | Ledana dil |
| Keval: | Tablo |
| Kêferat: | Xebata dijwar |
| Kujek: | Kuşdar, kujer, qatil |
| Makdêl: | Kurrê dêlê, dêlkê |
| Metîn: | Çiyayek li Başûrê Kurdistanê |
| Niyaz: | Niyet |
| Nihêngîr: | Bi nihênî |
| Niştê me: | Welatê me |
| Nola: | Mîna, wek |
| Pênas: | Nasname, kimlik |
| Seyda: | Hîvan, hîkar, mamosta |
| Şiyaye: | Kariye |
| Şerrokî: | Şerxwaz, har û şerfiroş |
| Tenahî: | Hêminî, asayiş |
| Ûlîemir: | (erebî) Serok, sultan |
| Varî: | Derketin ji rê |

Institut kurde de Paris

**Sipas**

Ez sipasdarê qenciya Mesud Serhedî û Beşîr Botanî me, yên ku ev Dîwan ji bo çapê berhev kirin.

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

# Naverok

Êdî bes e heta evro .................................. 6
Bi xoşî û serfirazî ......................................8
Bê te jîna min jan e .................................. 10
Gula min .........................................................11
Adar e ............................................................. 12
Jîna min e ev aqar ...................................... 13
Li me pîroz her û her ..................................14
Gemşo ..............................................................16
Kurdistan Kurdistan ....................................20
Cejna aştî .......................................................22
Ciwanê Kurd ..................................................24
Bilûra min .................................................... 25
Pîrejin ............................................................26
Pêşmerge........................................................28
Dengê dehola bextê min .............................29
Ji Botanî bipirse! ..........................................30
Şîreta min .................................................... 32
Şivanê pîr .................................................... 34

Institut kurde de Paris

Şanoya şoreşvan .......................................37
Ji vê şopa xwe vegerin ...........................38
Makdêl .....................................................40
Gurgo were xûnê bimêj ........................ 42
Venagerim ............................................... 45
Tajîkên nêçîra pîs .....................................46
Rabin Rabin ..............................................48
Marşa rizgarî ........................................... 50
De bimre lo ...............................................51
Sibe xwedî dewlet im ...............................52
Bo hevalê min Silo .................................. 54
Nefî hilo meydanê................................... 56
Bo kurdekî meynoş .................................59
Hîvan ..........................................................60
Şerm e kurro ..............................................62
Me îro PKK heye.......................................63
Caş ..............................................................64
Her kes û pîroza xo ................................ 66
Wek dîwarê Berlîn î tu ........................... 68
Mizgîniya Mezin .....................................70
Kurd im heta dimrim...............................72
Rojname.....................................................73
Di gel Yezdan ............................................74
Institut kurde de Paris



*Sebrî Botanî di gel dûdûkvan Îsmet û hunermend Nezmî Omeranî.*

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



*Sebrî Botanî*

...
Ji bîr nakim doza xwe
Qet naşkênim soza xwe

Şer dikim bê rawestan
Nizanim çi ye westan

Şer dikim, şer naxwazim
Welatê xwe dixwazim

Niştê min e, dêrîn e
Ber dilê min şêrîn e

Gerçî îro bindest im
Sibe ez jî serbest im
...

ISBN: 91-87730-47-2

**APEC**

Institut kurde de Paris

K.L.